

Weşanên KOMKAR

Ferheng

Kurmancî – Kirmanckî (zazakî)

Amadekar : Çeko Kocadag

Mîzanpaj : Çeko Kocadag

Çapê Yewine / Çapa Yekemîn : Citaşme / Cotmeh 2010

ISBN : 978-3-927213-40-1

Copyright : Çeko Kocadag

Çap : Concept Druckhaus Berlin GmbH

Adresê waştene/xwastinê : ceko.ferheng@web.de

Çapê yewine bi yarmetîya madî ya birêz Kemal Karadagî, Dr.Şükrü Gülerî, Servet Dîşçî, Hesên Polatî û
Alsebir Kerimogluî amê çapkerdene

Vervatene / Pêşgotin

Ez kî bi çekûyanê „cara kesî ferhengêde rêkûpêk amade nêkerdo“ dest bi vervatena xo bikerî. Mi ke pancês (desûpanc) serî ravê dest bi gureyê amadekerdena ferhengê kirmanckî (zazakî) – tirkî kerd, kîşta bîne de kî çekûyên kirmanckî û kurmancî (kirdaskî) şanîtênê têver. A raşte, mi qet bawer nêkerdêne, ke netîceyê têverşanîtena ê çekûyan ra, ferhengêde kirmanckî–kurmancî / kurmancî–kirmanckî o wo bivirazîyo.

Ez ji bi peyvên „tu kesî ferhengeke rêkûpêk amade nekiriye“ dest bi pêşgotina xwe bikim. Min ku panzdeh sal berê dest bi xebata amdekirina ferhenga kirmanckî (zazakî) – tirkî kir, di alîyê din da jî peyvên kirmanckî û kurmancî raberê hevdkirin. A rast, min qet bawer nedikir, ku ji encama raberkirina wan peyvên, ferhengeke kirmanckî–kurmancî / kurmancî–kirmanckî ew ê çêbibe.

Mi her çekûye û terma kirmanckîyî fênda gewherî hesabnê û cira lalekîya, ser ro vindeta. Edî vêşêriya ferhenganê kirmanckî–tirkî (pêro kî dorhemî yê) de, mana (vate) xêlê çekûyan bi îzahkerdene, ya kî vaşê yo, darê ya, mîlçikê ya ... û ê tayînan kî çewt û têmîyan dîya ci. Tîya de amanca mi kêmwarodayena kar û gureyê ê embazan qet nîyo. Her weşûwar bê. Mordem çiqas ke cat bikero kî, teberê welatî de amadekerdena ferhengêde kêmqusirînî zaf zahmet o. No, kar û barê sazgeh û dezgehan o. Ez çiqas kewta re ser, nêzana, lê bi birûbawerîya xêlê rayegirewtene der a.

Min her peyv û terma kirmanckîyê mîna gewher hesiband û jêre can da, liser sekinim. Di pîraniya ferhengên kirmanckî–tirkî (hemû jî heremî ne) de, wateya gelek peyvên bi îzahkirin, yan jî gîyayek e, darek e, balindeyek e ... û ya hinekan jî çewt û tevlihev hatine dayîn. Li vir amanca min biçûkxistina karûxebata wan hevalan qet nine. Ew her sax bin. Meriv her çiqas hewl bide jî, li dervayê welat amadekirina ferhengeke kêmqusurê zor zehmet e. Ev, karûbarê sazî û dezgehan e. Ez çiqas serketim, nizanîm, lê bi birûbawerîya gelek rêgirtinê de me.

Elemanên zîwanê nûskî yên bîngêhînî alfabe, razîwan (gamer) û ferheng o. Lînguîstîk rewşe henî nîşan dano, ke zaravayên kurdî herçî ke şîyê (bi taybetî kirmanckî) jubînî ra bîyê dûrî û kewtê qonaxê zîwananê xoser yên kurdî. Welatêde azad û federal de, ganî zîwanî hîmê xo ser ro birooyîyê û bicuyê. Na kî zengîniye û hêcayîya zîwanê kurdî ya. Ganî ma xo vîrî ra mekerîme, ke zîwan tenya pergalede komînikasyonî nê, o bihgehê kulturê hezar seran o. O bera yo, tarîx o, edebîyat o, huner o, muzîk o, ayende yo... Vîraştêna zîwanêde mekanîkî yo yewbîyaye, êno wateya miyan ra çînekerdena zafkulturiye. Bi bawerîya mi, na kî bûglat a.

Ewro zîwanê kurdî, bi taybetî kî kirmanckî edî xeta vîndîbiyene der o. Rayêde rarêyişê zîwanî ma ver de menda, a kî edî zîwanê dayîke de xodestfîştêna heqê perwerdeyî ya. Ganî her Kirmanco wayîrîqîret, edî na qewxa de cayê xo bigêro.

Hêmanên zimanê nivîskî yên bingehîn alfabe, rêziman û ferheng e. Lînguîstîk rewşê wisa nişan dide, ku zaravayên kurdî her ku çûne (bi taybetî kîrmanckî) jî hev bûne dûr û ketine qonaxa zimanên xweser yên kurdî. Di welateke azad û federal de, divê zimanan li ser hîma xwe birûwîkin û bijîn. Ev jî dewlemendî û hêjayîya zimanê kurdî ye. Divê em jî xwe bîr nekin, ku ziman tenê pergaleke komînkasyonê na, ew bingehê çanda hezar salan e. Ew adet e, dîrok e, edebîyat e, huner e, muzîk e, pêşeroj e... Çêkirina zimanê mekanîk ya yekgirtû, tê wateya jî holê tunekirina pîrçandîyê. Bi bawerîya min, ev jî karesat e.

Îro zimanê kurdî, bi taybetî jî kîrmanckî di xeta wendabûnê de ye. Rîyêke xilasa ziman ber me de maye, ew jî di zimanê dayikê de hilgirtina mafê perwerdeyî ye. Divê her Kurdê xwedîqîret, di vê tekoşînê de cîyê xwe bigire.

Standartêbîyena ziwani, bi semedê derg û dilayîya ferhengî. Qaso ke ez pê haydar a, reya verî ferhengêde nîyanên (wina) hetê mi ra amo amadekerdene. Pê zereşa û sereberz a.

Standartnebûna ziman, bû sedema dirêjbûna ferhengê. Qasê ku ez pê agahdar im, cara pêşî ferhengeke wisa bi alîyê min ve hatiye amadekirin. Pê dilşad û serbilind im.

Na kar û barê seran, sere de bi dem ra fedekarîye û yarmetîya kêyê (famîlya) mi; edi qonaxê amadekerdena ferhengî de bi pers-pursan bêzarkerdena verpersanê (cewab) kokim û embazanê hêcayan, û bi yarmetîya karê teknîkî yê birêz M. Şekerî, aferîya. Sala (boka) pêro weşûwar û berxûdar bê.

Ev kar û barê salan, li serî bi dem ra fedekarî û arîkarîya malbata min; pêvajoya amadekirina ferhengê de bi pîrs-pursan bêzarkirina bersiva kokim û hevalên hêja, û bi alîkarîya karê teknîkî ya birêz M. Şeker, hate afirandin. Bila hemû sax û berxûrdar bin inşallah.

Mi ke bi no gureyê xo xîçikê eşta qurçê kulturî û kar û xebatê vereroje ser, pê zereşa ya.

Min ku bi vê xebata xwe xîçeke avêtîye li ser qurça çand û kar û xebata pêşerojê, pê dilşad im.

Ziwanê dayike de heqê perwerdeyî ra bêpare mendeyan rê...

Çeko Kocadag

Berlin, **Gucige** / Sibat 2004

Bareyê bikarardena ferhengî de /Bareya bikaranîna ferhengê de

Madeyî pêro, gorê dora alfabeye ameyî rêzkerdene.

Hemû made li gor rêza alfabeyê hatine rêzkerin.

Qederî çekûya serê madeye, mi ca da bi berdewamiya çekûyanê înan kî: (çale *m.* çal, kort *m.* ~ çul kerdene çal û çul kirin)

Ji bilî peyva serê madeyê, min cî da berdewamiya peyvên wan jî; (çale *m.* çal, kort *m.* ~ çul kerdene çal û çul kirin)

Zereyê madeye de, hurêndîya madeyanê serekeyan de nişanê tildaye „~“ amê gurenayene û bi çekûyanê bînan devam kerîya: (vêşan *sn.* birçî, bîrsî ~ bîyene birçî bûn)

Di nav madeyê de, li şûna serê madeyê nişaneka tildayê „~“ hate danîn û bi peyvên din hate domkirin; (vêşan *sn.* birçî, bîrsî ~ bîyene birçî bûn)

Verê madeyanê serekeyan û zereyê madeyan de cayê çekûyanê raziwanî û çekûyên ke şaxanê zanistî ya kî termanê cayî nişan dane, bi kilmenûsan û îtalîkî nişan kerîyayî: *c.*, *sn.*, *rd.*, *d.*, *k.*, *l.*...; *ana. cog.*, *jeo.*, *fîz.*, *kîm.*, *sp.* ...ûêb.

Li pêşîya serê madeyê û hundurê madeyan de cîyê peyvên rêziman û peyvên ku şaxên zanistî yan jî termên cî nişan didin, bi kurtebêjan û îtalîkî hatin nişankirin; *c.*, *sn.*, *rd.*, *d.*, *k.*, *l.*...; *ana. cog.*, *jeo.*, *fîz.*, *kîm.*, *sp.* ...ûêd.

Seba ke ferheng derg mebo, peyqertafên ke „cî, kar, wan ... ûêb.“ nameyan afernenê, mi verê înan de zayenda nêrî û mayî „*n./m.*“ pîya nûsnayî. Êno a vata ke zayenda eyî nameyî nêrî „*n.*“ ya. Zayenda mayîya xo kî nîya virazîna: Çekûye ke bi herfanê bêvenginan „*b, c, d.*...ûêb. “ biqedîyo, rasterast herfa zayenda mayî „*e*“ ye gêna peyê xo. Nimûne: „wendekar *n.*, wendekar-*e m.*“; Çekûye ke bi herfanê venginan „*a, e, î.*...ûêb. “ biqedîyo, herfa têkewênayîşî „*y*“ ye kena mabeyn û herfa zayenda mayî „*e*“ ye gêna peyê xo. Nimûne: „dawilcî *n.*, dawilcî-*y-e m.*“

Bo ku ferheng dirêj nebe, paşqertafên ku „*cî, kar, wan* ... ûêd. “ navdêran diafrînin, min berê wan de zayenda nêr û mê „*n./m.*“ bi hev re nivîsandin. Tê wî wateya ku zayenda wê navî nêr „*n.*“ e. Zayenda mêyîya xwe jî wisa çêdibe: Peyv ku bi herfên dengdar „*b, c, d* ... ûêd. “ biqede, rasterast herfa zayenda mê „*e*“ ye digre paşîya xwe. Nimûne: „wendekar *n.*, wendekar-*e*“; Peyv ku bi herfên dengdêr „*a, e, î* ...ûêb. “ biqede, herfa kelijandinê „*y*“ ye dike navber û herfa zayenda mê „*e*“ ye digre paşîya xwe. Nimûne: „dawilcî *n.*, dawilcî-*y-e*“.

Karên sadeyî rewşa nameyî de, govdeyên xo bi peyqertafa „iş, yiş“ pêrabeste (kerdiş; kirin, bîyayiş; bûn, werdiş; xwarin, berdiş; birin...) nûsiyayî.

Lêkerên sade di rewşa navdêr de, govdeyên xwe bi paşqertafa „iş, yiş“ bi hev ve (kerdiş; kirin, bîyayiş; bûn, werdiş; xwarin, berdiş; birin...) hatin nivîsin.

Karên pêrabesteyî rewşa mastarî de cîya (berz kerdene; bilind kirin, sur kerdene; sor kirin...); edî rawşa nameyî de bi peyqertafa „iş“ î pêrabeste (berzkerdiş; bilindkirin, surkerdiş; sorkirin...) nûsiyayî.

Lêkerên hevedudanî di rewşa raderê de cuda (berz kerdene; bilind kirin, sur kerdene; sor kirin...); di rewşa navdêr de bi paşqertafa „iş“ bi hev ve (berzkerdiş; bilindkirin, surkerdiş; sorkirin...) hatin nivîsin.

Mi ferhengî de ca da bi îdyom û vatenanê verênan kî.

Min ferhengê de cî da biwêj û gotinên pêşyan jî.

Kirmanckî de çekûyên mayezayên ke bi herfa „e“ ye qedînê, bi apostrofe „’ e“ amê rabirnayene.

Di kimanckî de peyvên mēzayên ku bi herfa „e“ yê diqedin, bi apostrofê „’e“ hatine veqetandin.

Heyanî ke destebera mi ra amê, mi cat kerd ke ferhengî de ca bidîne cara ca cîyavajîyayîşê çekûyanê kirmanckîyî û nêrî û mayîya înan ya dorheme.

Heta ku jî destê min hat, min hewl da ku di ferhengê de cî bidim ji cî-cî cuda gotina peyvên kirmanckî û nêr û mēya wan ya heremê.

Qederî çekûyanê şarîmîyan de vajîyan ra, mi zîwanê kirmanckî de ca da bi çekûyan û termanê modern û newevirazîyan kî.

Ji bil peyvên di navgel de gotîyan, min di zîwanê kirmanckî de cî da peyv û termên nûza û nûçêkirî jî.

Her çend ke tayê nûskaranê zîwanê kirmanckîyî ferheng û nûsanê xo de hurêndîya herfa „e“ (dewe...) de, herfa „î“ (dewî...) ye nûsna kî, bi bawerîya mi, zîwanê kurdî de cara çekûyî bi herfa „î“ ye dest pênenê û nêqedînê. Naye ser ro, mi ferhengî de hurêndîya herfa „î“ de, herfa „e“ ye esas girewte.

Her çend ku hinek nivîskaranê zîwanê kirmanckî, di ferheng û nivîsên xwe de, li şûna herfa „e“ (dew’ e...) de herfa „î“ (dew’ î...) ye nivîsiye jî, bi bawerîya min, di zîwanê kurdî de tu car peyv bi herfa „î“ yê dest pênakî û naqedin. Liser vê yekê, min ferhengê de li şûna herfa „î“ de, herfa „e“ esas girt.

Kilmenûsî / Kurtenivîsan

ana.	Anatomî	Ing.	Lêkera negerguhêz; karo nêra- vêrde
arg.	Argo	ltb.	Lêkera tebatî; karo tebatin
ark.	Arkeolojî	lz.	Lêkera zivirandî; karo rexogê- raye
ast.	Astronomî	m.	Mayî; mê
b.	Baneşan; balnîşane	m/n.	Mê û nêr; mayî û nêrî
b.	Bestox; gîhanek	mat.	Matematîk
bio.	Biolojî	mec.	Mecazî
bn.	Balnîşane; baneşan	met.	Meteorolojî
bot.	Botanîk	mîn.	Mîneral
bw.	Biwêj; îdyome	muz.	Muzîk
bz.	Bazirganîye; bazirganî	N.	Navdêr; name
c.	Caname; cînav	n.	Nêrî; nêr
cog.	Cografya	n./m.	Nêrî û mayî; nêr û mê
d.	Daçek; pêrabestox	N./sn.	Name û salixname; nav û rengdêr
d.	Diyarker; hoker	N/rd,	Nav û rengdêr; name û salixname
der.	Deryayî	num.	Numre
dîn.	Dînî; olî	paq.	Paşqertaf; peyqertafe
dir.	Dîrokî; tarîxî	pb.	Pêrabestox; daçek
ede.	Edebîyat; wêje	Ped.	Pedagogî
eko.	Ekonomî, aborî; debere	pêq.	Pêşqertaf; verqertafe
fel.	Felsefe	pj.	Pirejimar; zafhûmar
fiz.	Fîzîk	pol.	Politîk
g.	Gîhanek; bestox	pq.	Peyqertafe; paşqertaf
geo.	Geometrî	psk.	Psîkolojî
h.	Hoker; diyarker	rd.	Rengdêr; salixname
hûq.	Hûqûqî	rd/h.	Rengdêr û hoker; salixname û di- yarker
îd.	Îdyome; biwêj	rz.	Raziwan; rêziman
jeo.	Jeolojî	sn.	Salixname; rengdêr
k.	Kar; lêker	sn./d.	Salixname û diyarker; rengdêr û hoker
kîm.	Kîmya	sos.	Sosyolojî
klb.	Karo lebatin; lêkera lebatî	sp.	Spor
knr.	Karo nêravêrde; lêkera neger- guhêz	tar.	Tarîxî; dîrokî
kr.	Karo rexogêraye; lêkera zivi- randî	tip.	Tip
ktb.	Karo tebatin; lêkera tebatî	vet.	Veterîner
kr.	Karo ravêrde; lêkera gerguhêz	vq.	Verqertafe; pêşqertaf
l.	Lêker; kar, demçekûye, fiîl	zh.	Zafhûmar; pirejimar
lşk.	Leşkerî	zoo.	Zoolojî
lg.	Lêkera gerguhêz; karo ravêrde		
llb.	Lêkera lebatî; karo lebatin		

Çundeyî / Çavkanî

1. Amirxan; Ferhengê Kurdîsch-Deutsch /Kurdî - Almanî Teil 1, Deutsch-Kurdîsch/Almanî-Kurdî Teil 2, Viyena 1992
2. Astore, Kemal; Cer Hard Cor Asmen, Weşanên Doz, Stenbol 1994
3. Birnebûn (kovare) 7, 8, 9, 10
4. Blau, J.; Kürtçe-Türkçe / Kürtçe-Fransızca / Kürtçe-İngilizce, Sosyal Yayınları, İstanbul 1991
5. Blau, Joyce; Ferhengê Kurdî u Tirkî 2, Weşanên Iivan 1975
6. Çeko; Razarê Dimilkî, Berlin 1997
7. Çelker, Xal; Ebe Yaranîye Kewtîme Rae, Tij Yayınları, İstanbul 1998
8. Çem. Munzur; Ferhengê Kurdî-Tirkî (Zazakî), 1995
9. Develioğlu, Ferit; Osmanlıca-Türkçe Lugat, Aydın Kitapevi Yayını, Ankara 99
10. Endam, Ronas; Vatenê Verênan, Azadî hejmar 101, 102, 103
11. Erdem, Turan; Ferhengê Zazakî-Tirkî /Tirkî-Zazakî, Doz, İstanbul 1997
12. Espar, J.; Tanî Estanikî û Deyirê Ma, Weşanên Rewşen 1995
13. Farqînî, Zana; Türkçe-Kürtçe Sözlük, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbole 00
14. Gruba Xebate ya Vateyi; Türkçe-Kirmanca (Zazaca) Sözlük / Ferhengê Kirmanckî (zazakî)-tirkî, Weşanên Avesta, İstanbul 2001
15. Gülmez, Mehmet; Dersim ra ve Dare Estene Seyit Rıza, Zed Yayınları, İstanbul 1996
16. Gündüz, Deniz; Kilama Pepugî, Vejayışê Vartani, Ankara 2000
17. İzolî, D.; Ferhengê Kurdî-Tirkî / Tirkî-Kurdî, Weşanên Deng, İstanbul 1992
18. Jele, Meme; Khalmemo Sır, Vejiyaişe Tiji, Estemol 2003
19. Malmîsanîj; Zazaca-Türkçe Sözlük/Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Jina Nu Yayınları 87
20. Omar, Feryad Fazil; Ferhenga Kurdî-Elmanî, VWB -Verlag für Wissenschaft und Bildung, Berlin 1992
21. Özcan, Mesut; Zazaca-Türkçe Sözlük, Kaynak Yayınları, İstanbul 1997
22. Paşa, Yusuf Ziyaddin; Kürtçe-Türkçe Sözlük (M.E.Bozarslan), Çıra Yayınları, İstanbul 1978
23. Paşa, Yusuf Ziyaddin; Osmanlıca- Türkçe Taraması (Prof.Dr. S. Inal Savi), Elila Yayınları, Ankara 1993
24. Pons; Standardwörterbuch Türkisch-Deutsch / Duetsch-Turkisch, Ernst Klett Verlag, Stuttgart 2002
25. Selcan, Zulfu; Gramatik der Zaza-Sprache Nord-Dialekt, Wissenschaft und Technik Verlag, Berlin 1998
26. Tija Sodiri (kovare) 3, 4, 5
27. Turgut, Harun; Zazaca-Türkçe Sözlük, Tij Yayınları, İstanbul 2001
28. Türk Dil Kurumu; Türkçe Sözlük, Ankara 1998
29. Vate (kovara kulturi) hûmar 1 - 20
30. Ware (kovare) 9, 10, 11
31. Xasî, Mela Ehmedê; Mewludê Nebî (tadox tipanê Erebi ra: Mihani), Weşanên Fırat, İstanbul 1994

Kurmancî – Kirmanckî (zazakî)

A

A N. a herfa yewine ya alfabe ya kurdî ya *m.*
a c. a, ya **~ te** a to, ya to **~ we** a şîma, ya şîma **~ wê** a aye, ya daye, ya aye **~ wî** a eyî, a êyî, a deyî, a dêyî
a dawîn rd. a peyene, o peyên, ê peyênî
a dîn c. a bîne, aya bîne
a kirîn lg. lelo kerdene, ayî kerdene, ela kerdene, elo kerdene (ziwanê domanan de)
a paşîn rd. a peyene, o peyên, ê peyênî
a rast h. a raste, bi rastiye, heqanet, a raşte
a rastî h. a raste, bi rastiye, heqanet, a raşte
a soxîn h. peynîye de, bi o şêwe, peynîya peyene, a peyene, a soxnîye, bi o toşe, soxnîye de
a welê h. a hên, a winî, ahên
a welê² h. a nîya, a winî, anîya, êna, una, îna
a wer h. a nîya, a winî, anîya, êna, una, îna
a wilo h. a hên, a winî, ahên
a wisa h. a hên, a winî, ahên, îna, una
a wisa² h. a nîya, a winî, anîya, êna, una, îna
aba n. eba, ewa, aba *m.*
abadîn rd. meser, cawîd, ebedî **~ bûn lng.** meser biyene, cawîd biyene, ebedî biyene, meserîyene **~bûn m.** meserbîyayîş, cawîdbîyayîş, ebedîbîyayîş *n.* **~î m.** meserîye, cawîdiye, ebediyênî, meserênî *m.* **~ kirin lg.** meser kerdene, cawîd kerdene, ebedî kerdene, cawîdnayene **~kirîn m.** meserkerdiş, cawîdkerdiş, ebedîkerdiş, mesernayîş *n.*
abajûr m. abajur *n.*
abakus m. abakuse, morekhûmare *m.*
abal rd. ragerayox, rageraye, racêraye **~ bûn lng.** ragerayene, wegerayene, raçerexîyene, ragêrayene, rageyrayene, yağêrayene, agêrayene, racêrayene
abegîne m. bilûr, bilor *n.*
abnoz m. bot. ebanozêre, ebenozêre, dara ebanoze, abenûsêre *m.*
abîd n. derwêş, abûd, dewrêş, doryeş, abût, dewryeş *n.*
abidane rd. derwêşkî, abûdkî, derwêşane, abûdane
abîde m. vîrdare, abîde, vîrkêle *m.* **~vî rd.** abîdeyî, vîrdarî, vîrdarên, abîdewî
abîne m. abîna (nargîle de) *m.*
abîs m. cog. çope, abîse *m.*
ablûka m. abluka *m.*, têrapîştîş *n.*
abone m. abone *n.* **~ bûn lng.** abone biyene **~tî m.** aboneyîye, aboneyênî *m.*
abonman m. abonman, aboneman *n.*
abor m. rêçe *m.*
abor² m. deber, şelik, îdare, debar, şîelik, şiyelik *n.* **~andin lg.** debernayene, şelik kerdene, ravîyarnayene, deber kerdene, vîyarnayene, derbaz kerdene, vernayene, îdare kerdene, debar kerdene, deberê xo kerdene **~ bûn lng.** deber biyene, şêlik biyene, deberîyene, ravêrîyene, derbaz biyene **~în lg.** debernayene, şelik kerdene, ravîyarnayene, deber kerdene, vîyarnayene, derbaz kerdene, vernayene, îdare kerdene, debar kerdene, deberê xo kerdene **~ kirîn lg.** debernayene, şelik kerdene, ravîyarnayene, deber kerdene, vîyarna-

yene, derbaz kerdene, vernayene, îdare kerdene, debar kerdene, deberê xo kerdene

aborî m. ekonomî *n.*, debere *m.*, îktisad *n.* **~nas m/n.** deberzan, ekonomîst, debersînas *n.* **~nasi m.** debersînasîye, ekonomîzme, deberzanîye *m.* **~ya neteweyî N.** debera neteweyîye *m.*, ekonomîyê neteweyî *n.*, debera mîliye *m.* **~ya pazarê N.** debera bazarî *m.*, ekonomîyê bazarî *n.*, debera pîyaseyî *m.*, ekonomîyê pîyaseyî *n.* **~ya plankirî m.** debera planîne *m.*, debera tesarîne *m.*, ekonomîyo planîne *n.*, debera plankerdeye *m.* **~ya siyâsî N.** debera siyâsiye *m.*, ekonomîyo polîtîk *n.* **~ya velkîrî N.** debera rakerdiye *m.*, ekonomîyo rakerde *n.* **~ya zanistî N.** debera zanistî *m.* **~yî rd.** deberî, ekonomîk, îktisadî, deberên **~zan m/n.** deberzan, ekonomîst, debersînas *n.* **~zanî m.** debersînasîye, ekonomîzme, deberzanîye, debersî-nasênî *m.*

abûb m. bahane, mane, mene, baxane *n.*

acenta m. acenta, ajenta *m.* **~tî m.** acentayîye, acentayênî *m.*

acîz rd. bêzar, acîz, ecîz, edîz **~ane h.** neçarane, bêhêzane, acîzane **~ bûn lng.** bêzar biyene, acîz biyene, canbêzar biyene, bêzarîyene, ecîziyene **~bûn m.** bêzarbîyayîş, acîzbîyayîş, canbêzarbîyayîş, bêzarîyayîş, ecîziyayîş *n.* **~bûyî rd.** bêzarbîyaye, acîzbîyaye, canbêzarbîyaye, bêzarîyaye. **~î m.** bêzarîye, acîziye, bêzarênî, acîzênî *m.* **~în lng.** bêzar biyene, acîz biyene, canbêzar biyene, bêzarîyene, ecîziyene **~în m.** bêzarbîyayîş, acîzbîyayîş, canbêzarbîyayîş, bêzarîyayîş, ecîziyayîş *n.* **~ker m/n.** bêzarker, acîzker, bêzarnayox *n.* **~ kirîn lg.** bêzar kerdene, acîz kerdene, canbêzar kerdene, bêzarnayene, ecîznayene **~kirîn m.** bêzarnayîş, bêzarkerdiş, acîzkerdiş, acîznayîş *n.* ***hatin acîzkirîn ltb.** bêzar kerîyene, acîz kerîyene, ameyene bêzarkerdene, ameyene acîzkerdene

acîl rd. lezik, acîl, lertzik

acûr m. bot. kute, xirtik, xitî, acûr *n.*

acûr² m. kasik, kîremît, xilik, kîramîd *n.* **~firoş m/n.** tuxlarotox *n.* **~firoşî m.** tuxlarotoxiye, tuxlarotoxênî *m.* **~ker m/n.** tuxlaviraşttox, tuxlacî *n.* **~pêj m/n.** kasikpoj, kîremîtpoj, xilikpoj *n.*

ada m. ropejîknayîş, tereşnayîş, gilkerdiş, pejîknayîş *n.* **~ kirîn lg.** ropejîknayene, tereşnayene, ropezeknayene, gil kerdene, pejîknayene, terîşnayene, gilnayene

adab m. bera, adet, urf, odet *n.*

adan m. atî *n.*, werd *n.*, xida *m.*, wer *n.*

adan² rd. hîrîn, berîn, hîrdar **~î m.** hîr *n.*, bereket *n.*, bolîye *m.*, gurîye *m.*, feyz *n.*, bolênî *m.*

adar m. mart *n.*, adare *m.*, wîsara verêne *m.*, edale *m.*

ade rd. adî

ade² N. gazgazok *n.*, lulikên gazgazokî *zh.*

ade³ m. kax, eşefe, kalan *n.*

ade⁴ m. ropejîknayîş, tereşnayîş, gilkerdiş, pejîknayîş *n.*

~ kirîn lg. ropejîknayene, tereşnayene, ropezeknayene, gil kerdene, pejîknayene, terîşnayene, gilnayene

adem m/n. merdîm, însan, adem, benî *n.* **~î rd.** ademî,

merdimşi, merdimên ~**îzad** *m.* merdimza, benîadem, benîmerdim *n.* ~**xor** *n.* merdimwer *n.* ~**za** *n.* merdimza, ademza, benîza *n.*
adenit *m. tip.* adenit *n.*
adeptasyon *m.-bîyo.* întibaq, adaptasyon *n.*
adapte *rd.* adapte ~ **bûn** *lng.* adapte biyene ~ **bûn** *m.* adaptebiyayış *n.* ~ **kirin** *lg.* adapte kerdene, re ciardene ~ **kirin** *m.* adaptekerdiş, reciardiş *n.*
adeptor *m.* adaptor, reciardox *n.*
adese *m. fiz.* adese, mercûke, mercege *m.* ~ **dar** *rd.* mercûkin, mercegin, adeseyin
adet *m.* dane *m.*, hebe *m.*, dende *m.*, libe *m.*, tane *m.*, aded *n.*
adet² *n.* bera, adet, urf, odet *n.* ~ **bûn** *lng.* bera biyene, edet biyene ~ **perest** *rd.* beraperest, adetparêz, adetci, beraparêz ~ **peresti** *m.* beraperestiye, adetparêziye, beraperesteni *m.*
adil *rd.* edaletperwer, adil, dadmend, dadperwer, edil ~ **ane** *rd.* adilane, heqane, dadmendane
adir *m. tip.* fef *n.*, sara *m.*, epilepsi *m.*
adi *rd.* adi ~ **bûn** *lng.* adi biyene ~ **bûn** *m.* adibiayış *n.* ~ **kirin** *lg.* adi kerdene, adinayene ~ **kirin** *m.* adikerdiş *n.* ~ **ti** *m.* adiyiye, xaxiye, adiyeni *m.*
adli *rd.* edli, dadî, adli
adode *m.* çanqil, asinê serê çogane *n.*
adode² *m.* giştanik, engiştane, giştane *n.*
adres *m.* adres, nameûnişan *n.* ~ **a postê elektronikê** *N.* adresê elektronikposteyî, adresê e-posteyî, adresê e-mailî *n.*
adu *rd.* adi
adû *pj.* gazgazokî, lulikên gazkerî
aerodinamik *m.* aerodinamik *n.*
af *m.* efe, afe *m.* ~ **bûn** *lng.* baxşiyene, ef biyene, beş biyene, af biyene, beşbiyene ~ **kirin** *lg.* ef kerdene, baxşnayene, efnayene, af kerdene, cira vërayene, beşnayene ~ **kirin** *m.* efkerdiş, efnayış, baxşnayış, afkerdiş *n.*
afat *m.* bûglate *m.*, felakete *m.*, bêtere *m.*, afete *m.*, bela *n.*
afarinende *m/n.* afernayox, xuliknayox, viraşttox, afarnayox *n.*
afaride *rd.* afernaye, mexlûq, xuliq, xaliq, benî, afarnaye
afarin *b.* afarin, bicuye, biciwiye, eferim
afarinek *n.* xuyset, karakter, seciye, afernek *n.*
afarış *m.* hameyn *n.*, afarış *n.*, cibiliyet *n.*, xuye *m.*, fitrat *n.*, hilkat *n.*
afet *m.* bûglate *m.*, felakete *m.*, bêtere *m.*, afete *m.*, bela *n.* ~ **jenti** *rd.* bûglatzede, bêterzede, felaketzede, afetzede ~ **zade** *rd.* bûglatzede, bêterzede, felaketzede, afetzede
Afganistan *m.* Afganistan *n.* ~ **i** *N/rd.* afganistanij
afir *m.* anige, are, hare *m.*
afirandin *lg.* afernayene, xuliqnayene, xaliqnayene, -afarnayene
afirandin *m.* afernayış, viraştış, xuliqnayış, xaliqnayış *n.*
afirandi *rd.* afernaye, mexlûq, xuliq, xaliq, benî, afarnaye
afirîn *m.* aferiyayış, xuliqiyayış, xaliqiyayış *n.*
afirîn *lng.* aferiyene, xuliqiyene, xaliqiyene
afirînek *m/n.* afernayox, xuliknayox, viraşttox, afarnayox *n.*
afirînek *m.* aferneke, esere, vergure, berheme *m.*

afirînde *m/n.* afernayox, xuliknayox, viraşttox, afarnayox *n.* ~ **ti** *m.* afernayoxiye, xuliknayoxiye, afernayoxeni *m.*
afirîner *m/n.* afernayox, xuliknayox, viraşttox, afarnayox *n.* ~ **i** *m.* afernayoxiye, xuliknayoxiye, afernayoxeni *m.*
afiş *m.* afiş *n.* ~ **ker** *m/n.* afişker, afişci *n.* ~ **keri** *m.* afişkeriye, afişciyiye, afişkereni *m.*
afiyet *m.* afiyet, norşecan, weşecan *n.* ~ **be** *b.* afiyet bo, weşecan bo, norşecan bo, şitê maûpiyê to bo, helalûweş bo, şirûşekir bo!
aforoz *m.* aforoz *n.* ~ **kirin** *lg.* aforoz kerdene
afrandêr *m/n.* nivîskar, nûskar, nuşttox *n.*
afrandêr² *m/n.* afernayox, xuliknayox, viraşttox, afarnayox *n.* ~ **i** *m.* afernayoxiye, xuliknayoxiye, afernayoxeni *m.*
afret *m.* cinîye, cinî, cinîke, cênîye, cênîke, ceneke, cenî, cinîke *m.*
Afrika *m.* Afrîka *m.* ~ **Başûr** *m.* Afrîka Vaşure, Afrîkaya Vaşure *m.* ~ **a Navendî** *m.* Afrîka Mîyande, Afrîkaya Mîyande *m.* ~ **yî** *N/rd.* afrîkayij
Afrîqe *m.* Afrîka *m.* ~ **yî** *m/n.* afrîkayij *n.*
afsûn *m.* efsûn, sêr, sêhr *n.* ~ **dar** *rd.* efsûnin, sêrdar, sêrin
aftawe *m.* tawike *m.*, miqil *n.*, tawe *m.*, qanzik *n.*, miqilik *n.*, miqlê *n.*
agah *m.* hay *n.*, xebere *m.*, salix *n.*, hayî *n.*, haye *m.* ~ **bûn** *lng.* hay biyene ~ **dar** *rd.* haydar, malûmatin, xebardar, hayîdar, hağîdar ~ **dar bûn** *lng.* haydar biyene, xebardar biyene, haydariyene ~ **dar kirin** *lg.* haydar kerdene, xebardar kerdene, haydarnayene ~ **darî** *m.* haydariye, haydarênî, xebardariye, xebardarênî *m.* ~ **darîya gel** haydariya şarî ~ **darname** *m.* teblîxate, dazanayîşe, haydarname, teblîgate *m.* ~ **îya siruştî** *N.* haydariya xozayî, haydariya tabiati, haydariya xores-teyî *m.* ~ **ker** *m/n.* hayker, haynayox *n.* ~ **kirî** *rd.* haydarkerde, xebardarkerde, haydarnaye
agahî² *m.* haye *m.*, haydariye *m.*, zaniş *n.*, pêzanayış *n.*, malûmat *n.*, hay *n.*, xebere *m.*, salix *n.*, hayî *n.* ~ **bi destxistin** haydariye bi dest fiştene, malûmat bi dest fiştene ~ **dan** *lg.* haydariye dayene, malûmat dayene ~ **girtin** *lg.* haydariye girewtene, malûmat girewtene ~ **stendin** *lg.* haydariye girewtene, malûmat girewtene
agihandin *lg.* haydar kerdene, xebardar kerdene, haydarnayene
agihandin² *lg.* tahdît kerdene, kêmnayene, sîndornayene, sînornayene
agihîn *lng.* haydar biyene, xebardar biyene, hadariyene
agir *m.* adir, adil *n.* ~ **avêj** *m.* kewkanî, mancînik, bereşttox, kemereşttox *n.* ~ **bar** *rd.* adirin, adirdar, adirvar ~ **baran** *m.* bombardiman, adirvaran *n.* ~ **barandin** *lg.* adir varnayene, adir rişnayene ~ **barandin** *m.* adirvarnayış *n.* ~ **barîn** *lng.* adir varayene ~ **baz** *n.* adircî, adirbaz, adirwan *n.* ~ **bazî** *m.* adirciyiye, adirwanîye, adirbazîye, adirwanênî, adirciyênî *m.* * **agir berda dilê min** adir verda re kezaba/zereyê min ~ **berdan** *lg.* adir civerdayene, vëşnayene, adir cîştene ~ **best** *m.* **îşk.** adirbir, adirbest, cengvîdarnayış, mutareke *n.* ~ **bestin** *lg.* adir birnayene, adir bestnayene, adir vindarnayene ~ **bir** *m.* **îşk.** adirbir, adirbest, cengvîdarnayış, mutareke *n.* ~ **biran** *m.* **îşk.** adirbir, adirbest, cengvîdarnayış, mutareke *n.* ~ **birîn** *lg.* adir birnayene, adir bestnayene, adir vindarnayene ~ **dadan** *lg.* adir weker-

dene, adir tafiştene, adir devistene, adir vēşnayene ~**dank** *m.* maŋqale, adirdange, maŋqal *m.* ~**dar** *rd.* adirin, adirdar, adirvar ***agir dilê min ket** adir kewte re kezaba min ~**ê geş** adiro gur ~**geş** *rd.* adirgur ~**geşkirin** *lg.* adir gurkerdene, adir gurnayene ~**gir** *rd.* vēşayox, adirgirewtox, vēşox ~**girtin** adir girewtene ~**î** *rd.* adirên, adirî ~**jê rijîn** adir cira pekîyene, cira adir pekayene ~**ker** *m/n.* adirker *n.* ~**kirin** *lg.* adir kerdene. ***dan agirkirin** *llb.* dayene adirkerdene, adirnayene ~**kuj** *m/n.* îtfayecî, vēşweberdox, adirweberdox, adirtefênayox, adirkişttox, adirweşaynayox *n.* ~**nak** *rd.* adirin, adirdar, adirvar ~**nak²** *rd.* vēşnayox ~**parest** *m/n.* adirperest *n.* ~**parestî** *m.* adirperestîye, adirperestênî *m.* ~**parêz** *m/n.* adirperest *n.* ~**parêzî** *m.* adirperestîye, adirperestênî *m.* ~**perest** *m/n.* adirperest *n.* ~**perestî** *m.* adirperestîye, adirperestênî *n.* ~**pij** *m.* volkan, adirpij, koyo adirvar *n.* ~**rawestan** *m.* lşk. adirbir, adirbest, cençvîndarnayîş, mutareke *n.* ~**rawestandin** *lg.* adir birnayene, adir bestnayene, adir vindarnayene ~**song** *m/n.* îtfayecî, vēşweberdox, adirweberdox, adirtefênayox, adirkişttox, adirweşaynayox *n.* ~**songî** *m.* îtfaiye, adirtefênayîye, adirkiştîye, îtfaye *m.* ~**sotin** *lg.* adir wekerdene, adir tafiştene, adir devistene, adir vēşnayene ~**temirandin** *lg.* adir weberdene, adir weşaynayene, adir tefênayene, adir hewna kerdene, adir mirênayene. ***agir û alav** adir û kile, adir û alawine, adir û kilawine ~**van** *n.* adircî, adirbaz, adirwan *n.* ~**vanî** *m.* adircîyîye, adirwanîye, adirbazîye, adirwanênî, adircîyênî *m.* ~**vekuj** *m/n.* îtfayecî, vēşweberdox, adirweberdox, adirtefênayox, adirkişttox, adirweşaynayox *n.* ~**vekuştin** *lg.* adir weberdene, adir weşaynayene, adir tefênayene, adir hewnayene, adir mirênayene ~**vemirandin** *lg.* adir weberdene, adir weşaynayene, adir tefênayene, adir hewnayene, adir mirênayene ~**vekutin** *lg.* adir pêkewtene, adir dekewtene, adir cikewtene ~**vês** *m/n.* îtfayecî, vēşweberdox, adirweberdox, adirtefênayox, adirkişttox, adirweşaynayox *n.* ~**vêşartin** *lg.* adir nimitene, adir wedardene, adir têminîtene ~**vêxistin** *lg.* adir wekerdene, adir tafiştene, adir devistene, adir vēşnayene ~**vêxistin** *m.* adirwekerdiş, adirtafiştîş *n.* ~**xane** *m.* adirxane, adirgeh *n.* ~**xweş** *rd.* gonîşîrîn, gonîgerm, şabeweş, sempatîk, weşrî ~**xweş bûn** *lg.* gonîşîrîn biyene, gonîgerm biyene, şabeweş biyene, şîrîn biyene, weşrî biyene ~**xweşbûn** *m.* gonîşîrînbiyayîş, gonîgerm-biyayîş, şabeweşbiyayîş, şîrînbiyayîş, weşrîbiyayîş *n.* ~**xweş kirin** *lg.* gonîşîrîn kerdene, gonîgerm kerdene, şabeweş kerdene, şîrîn kerdene, weşrî kerdene ~**xweşkirin** *m.* gonîşîrînkerdîş, gonîgermkerdiş, şabeweşkerdiş, şîrînkerdîş, weşrîkerdiş *n.* ~**xweşkî** *m.* gonîşîrîniye, gonîgermiye, şabeweşîye, sempatî, şîrîniye, weşrîyênî, gonîşîrînênî, gonîgermênî *m.*

agirdank *n.* adirge, çeçmaq, çamaç *n.*

agirdiz *m.* piye *m.*

agire *m.* tip. frengî, frengzehmetî, frengzametî, frîngzehmetî *n.*

agnostik *rd.* agnostîk

agnostisizm *m.* agnostîsiye, agnostîsîzme *m.*

agû *m.* gix, gixik (doman) *n.*

ah *b.* ax, ah

aha *b.* aha

aha *rd.* wina, anîya, nîya, anya

ahar *m.* nigare, desen *n.* ~**dar** *rd.* nigareyîn, desenin
ahd kirin *lg.* wad kerdene, peyman dayene, soz dayene, ahd kerdene

aheng *m.* aheng *n.* ~**a dengan** *N.* ahengê veng *n.* ~**çêkirin** *lg.* aheng ronayene, aheng sazkerdene, pêkewtiş ronayene ~**dar** *rd.* ahengdar, ahengin ~**dar kirin** *lg.* ahengdarnayene, ahengdar kerdene ~**darî** *m.* ahengdarîye, ahengdarênî *m.* ~**pêk anîn** *lg.* aheng ronayene, aheng sazkerdene, pêkewtiş ronayene
ahên *m.* jan *n.*, axîne *m.*, dej *n.*, kul *n.*, hês *n.*, derd *n.*, ezab *n.*, azar *n.*

ahîze *m.* fîz. ahîze *n.*, reseptor *n.* girewtox *n.*

ahsûme *m.* boza *m.* ~**ker** *m/n.* bozacî, bozawan *n.* ~**kerî** *m.* bozacîyîye, bozawanênî *m.*

aşşap *rd.* darên, aşşap, textên

ahtapot *m.* zoo. heştpaye, ahtapote, heştlinge *m.*

ahû *m.* zoo. hêreke, aske, xezale, ahuye *m.*

Ahûramazda *N.* Ahuramazda, dinê Zerduştî de Homayo tewr pîl *n.*

aidat *m.* ayidat, aîdat *n.*

aîd *d.* aîd, ayid

aîdandin *lg.* têmiyan kerdene, têkil kerdene, têvdayene
aj *m.* aje, are, xelfe, lîze, aşqune, filîze, quare, hare, ajîke *m.* ~**dan** *lg.* aj dayene, zil dayene, gîl dayene, lîz dayene, çîlik dayene ~**dar** *rd.* ajîn, xelfin, lîzin, aşqunin, filîzin, quarin

ajal *n.* heywan, terş, heywon, heywun, heyban *n.* ~**darî** *m.* heywanîye, terşdarîye, heywancîyênî *m.* ~**ên dusimî** *n.* zoo. terşên disimî, heywanên disimî *zh.* ~**ên kavêj** *N.* nişorkerî, heywanên nişorkerî *zh.* ~**ên nekavêj** *N.* nişornêkerî, heywanên *zh.* ~**ên pîrpêk** *N.* zafpayî, heywanên zafingî, terşên zafingî *zh.* ~**î** *rd.* heywanî, terşî, ~**kî** *rd.* heywankî, dewarkî, heywanane ~**nas** *m/n.* heywanşinas, zoolog, terşşinas, heywannas *n.* ~**nasî** *m.* heywanşinasîye, zoologî, terşşinasîye, heywannasîye, zoolojî *m.* ~**parêz** *rd.* heywanparêz, terşparêz

ajan *m/n.* sixur, casus, ajan, acan *n.* ~**î** *m.* sixuriye, casusiye, ajanîye, sixurênî, casusênî, ajanênî *m.*

ajanda *m.* ajanda *m.*

ajans *m.* ajans, acans *n.* ~**a dengûbehsan** *N.* ajansê vengûvaj, ajansê heyaman, ajansê xeberan *n.* ~**a nûçeyan** *N.* ajansê vengûvaj, ajansê heyaman, ajansê xeberan *n.*

ajar *m.* lşk. cebilxane, cebxane, cebilxune *n.*

ajawa *m.* têmiyanîye *m.*, fitne *n.*, aloziye *m.*

ajawe *N.* bêzarîya canî, aciziya canî, canbêzarîye *n.*

ajawe *m.* guraniye *m.*, haybro *n.*, qerebelix *n.*, hereşe *n.* ~**bûn** *lg.* haybro biyene, qerebelix biyene, hereşe biyene, guraniye biyene, gurintî biyene, qerebelix biyene ~**bûn** *m.* haybrobiyayîş, qerebelixbiyayîş, guraniyebiyayîş, gurintîbiyayîş *n.*

ajegor *rd.* asteûposte, qerqele

ajel *n.* heywan, terş, heywon, heywun, heyban *n.*

ajewaker *rd.* provokator, fitker, tizker ~**î** *m.* provokatorîye, fitkerîye, tizkerîye, provokatorênî, fitkerênî, tizkerênî *m.*

ajik *m.* aje, are, xelfe, lîze, aşqune, filîze, quare, hare, ajîke *m.*

ajik² *m.* vama tale, tahlîke, vamic, tahlvame, gewrvam *m.*

ajinin *lg.* têvdayene

ajîne *n.* berantox, kemerantox, sîantox *n.*

ajîne² *n.* zomp, gudê keran, varoz, zonp, guidey kerun *n.*

ajıtasyon *m.* ajıtasyon *n.*
ajne *m.* ajne, asna, azna, asnawe, azne, asnawî, ajnî, acne, esnaw *n.* ~ **ber** *m/n.* ajneber, asnaber, asnawer, azneber, asnawber, aznewer *n.* ~ **berî** *m.* ajneberîye, asnaberîye, asnawerîye, ajneberênî, asnaberênî *m.*
~berî kirin *lg.* ajneberîye kerdene, asnaberîye kerdene, asnawerîye kerdene, azneberênî kerdene, ajneberênî kerdene. ***dan ajnêkirin** *ltb.* dayene as-nakerdene, dayene ajnekerdene. ***hatin ajnêkirin** *ltb.* ajne kerîyene, asna kerîyene, ameyene asnakerdene, ameyene ajnekerdene ~ **ker** *m/n.* ajneber, asnaber, asnawer, azneber, asnawber, aznewer *n.* ~ **kirin** *lg.* ajne kerdene, asna kerdene, asnaw kerdene, azne kerdene, esna kerdene ~ **ya qulancê** *N.* ajneyê pasî, ajneyê qulacî, asnayê qulacî, qulacajnî *n.*
ajo *m.* fel. saîq *n.*
ajoker *m/n.* ramitox *n.* ~ **î** *m.* ramitoxîye, ramitoxênî *m.*
ajoker *m/n.* şofer, ramitox, şofor, şufer *n.* ~ **î** *m.* şoferîye, ramitoxîye, şoferênî *m.*
ajotin *lg.* ramitene, rûmitene, romitene
ajotin *m.* ramitîş *n.*
ajotvan *m/n.* ramitox *n.* ~ **î** *m.* ramitoxîye, ramitoxênî *m.*
ajovan *m/n.* ramitox *n.*
ajovan *m/n.* şofer, ramitox, şofor, şufer *n.* ~ **î** *m.* şoferîye, ramitoxîye, şoferênî *m.*
ajût *m.* fixan *n.*, zibarîye *m.*, qîrayîş *n.*, feryad *n.*, qîjayîş *n.*, zarîye *m.*, figan *n.*
ajûtin *lng.* qîrayene, qîjayene, feryad kerdene, fixan kerdene
akademî *m.* akademî, wendegeho berz, mektebo berz *n.* ~ **k** *rd.* akademîk, akademîyên
akademîsyen *m/n.* akademîsyen, endamê akademîye *n.*
akam *m.* peynîye *m.*, berko *n.*, netîce *n.*
akasya *m.* bot. akasyêre, darakasya, akasya *m.*
akincî bûn *lng.* ca biyene, cawar biyene, bi ca biyene
akincîbûn *m.* cabîyayîş, cawarbiyayîş, bicabîyayîş, caûwarbiyayîş *n.*
akincî kirin *lg.* ca kerdene, cawar kerdene, bi ca kerdene
akincîkirin *m.* cakerdiş, cawarkerdiş, bicakerdiş *n.*
akîmîlator *m.* fiz. akumulator, aku, herekkomnayoxe *m.*
akord *m.* muz. kok, akord, kort *n.* ~ **ker** *m/n.* kokker, koknayox, akordker *n.* ~ **kirin** *lg.* kok kerdene, koknayene, akord kerdene ~ **kirî** *rd.* kokkerde, kokin, akordkerde, akordin, bikok, kokdar ~ **kirî** *rd.* kokkerde, kokin, akordkerde, akordin, bikok, kokdar ~ **nekirî** *rd.* bêkok, bêakord, koknêkerde, akordnêkerde, nêkokin
akordeon *m.* akordiyone, akordeone *m.*
akordiyon *m.* akordiyone, akordeone *m.*
akreditîf *m.* nama kredîyî, akreditîfe *m.*
akrobasi *m.* canbazîye, canbazênî *m.*
akropol *m.* akropole *m.*
aksan *m.* fek, aksan *n.*
akselerograf *m.* akselerografe *m.*
akselerometre *m.* akselerometre *m.*
aksesuwar *n.* aksesuar *n.*
aksiyom *m.* aksiyom *n.*
aksiyon *m.* aksiyon, liv *n.*
akson *m.* ana. aksone *m.*
aktif bûn *lng.* livdar biyene, feal biyene, têzik biyene, lebatkar biyene, çîpik biyene
aktif kirin *lg.* livdar kerdene, feal kerdene, têzik kerdene, lebatkar kerdene, çîpik kerdene

aktivîst *rd.* lebatkar, felîhsaz, aktivîst, lebatwan, lebat-saz, livsaz
aktor *n.* weyn, aktor, weynik *n.* ~ **î** *m.* weynîye, aktorîye, weynênî, aktorênî, weynikîye *m.*
aktrîs *m.* weyne, aktrîse, weynike *m.*
aktuel *rd.* aktuel, rojî, ewroyî
aktuelîte *m.* rojane, aktuelîte *m.*
aktuelîte² *m.* aktuelîte *m.*
akumîlator *m.* fiz. akumulator, aku, herekkomnayoxe *m.*
akupunktur *m.* akupunktur *n.*
akustîk *rd.* akustîk, vengwedayîşên, nofên, gulbangên
akû *m.* fiz. akumulator, aku, herekkomnayoxe *m.*
akvaryum *m.* akvaryum *n.*, akvaryume *m.*
al *m.* beyraqe *m.*
ala *m.* beyraqe *m.* ~ **dar** *n.* beyraqdar *n.* ~ **hilgir** *n.* beyraqdar *n.* ~ **hilgirî** *m.* beyraqdarîye, beyraqdarênî *m.* ~ **kêş** *n.* beyraqdar *n.*
alagoşk *m.* tip. algoşe, belegoş, xiyarek, goşdegînayîş, goşrep, yarek, belenguş, qenaqutik, qebaxqulax, alguşe *n.*
alale *m.* bot. lale, korbize *m.*
alan *m.* nof, gulbang, vengwedayîş, eko, zimî *n.*
alandin *lg.* pîştene, dorme berdene, pêştene
alandî *rd.* pîşte
alarm *m.* alarm *n.*
alastin *lg.* lêstene, lîstene, liştene, lêsayene, lîsayene
alastin *m.* lêstîş, lîstîş, lêsayîş *n.* **xwe alastin** *lng.* xo lêstene. ***xwealastin** *m.* xolêstîş *n.*
alâş *m.* çîqil, lizge, gile, gulî, gêl, gil *n.*
alav *n.* alet, hacet, pergal, halet *n.* ~ **dar** *rd.* pergalin, hacetin, aletin
alav² *m.* alawe, kile, kilawîne, alawîne, elawe, alamacî, alafe *m.* ~ **dan** *lng.* gur biyene, şên biyene, kile dayene
alay *m.* lşk. alaye, hêze *m.*
alaz *m.* amance, xaye, amace, mexsed, hedefe *m.*
alaz *m.* qestkerdiş, qestnayîş *n.* ~ **kirin** *lg.* qest kerdene, qestnayene ~ **kirin** *m.* qestkerdiş, qestnayîş *n.*
albalû *m.* wîşna, albalîye, fişna, wîşna, fişna, işna, işne *m.*
Alban *m/n.* arnawîd, alban *n.* ~ **î** *m.* arnawîdkî, albankî *n.* ~ **ya** *m.* Arnawîdistan, Albanya, Albanistan *n.*
albatr *m.* albatre, mermera awe *m.*
albûm *m.* albûme *m.*
alegor *m.* serbiser, trampe, teqez, têyvurnayîş *n.* ~ **kirin** *lg.* serbiser kerdene, teqez kerdene, trampe kerdene, serbiser dayene
alek *m.* ana. liske, gume, gepe, sirote, alişke, gumike, luske *m.*
alem *m.* alem *n.* ~ **giştî** *rd.* cîhanpêroyî, şartêvterî, kaînatî
alemînyûm *m.* kîm. bafîn, alemînyum, alemon *n.*
alerjî *m.* îre, hîr, xur, xurek, alerjî *n.* ~ **bûn** *lng.* îre vetene, xurek vetene ~ **bûn** *m.* şaplorevetîş, îrevetîş, xurekvetîş *n.* ~ **k** *rd.* îreyên, alerjîk
alet *n.* alet, hacet, pergal, halet *n.* ~ **ê sûc** *N.* hacetê sûcî, aletê sûcî *n.*
alev *m.* alawe, kile, kilawîne, alawîne, elawe, alamacî, alafe *m.*
alewî *rd.* alewî, qizilbaş, elewî, alawî ~ **tî** *m.* alewîyîye, qizilbaşîye, elewîyênî, alewîyênî *m.*
aleykumselam *b.* aleykumsilam

alênc *m.* alinc *n.*

alêsek *m/n.* lêstox *n.*

alfabe *m.* alfabe, alfabete, abece, elfeba, abce, elifba *m.*

alif *n.* alef, debir, dilig, yêm, êm, dilik *n.* ~ **andin** *lg.* alef dayene, yêm dayene, alefnayene ~ **andin** *m.* alefdayiş, alefnayiş *n.* ~ **dan** *lg.* alef dayene, yêm dayene, alefnayene ~ **dan** *m.* alefdayiş, alefnayiş *n.*

alim *m/n.* alim, zanyar, zana, zanyox, zanox *n.* ~ **ê dînî** *N.* alimê dînî, zanyarê dînî *n.*

aliqandin *lg.* aleqnayene, darde kerdene, pira aleqnayene, pede aleqnayene, pira dardekerdene, daliqnayene, eleqnayene

aliqandî *rd.* dardekerde, aleqnayene

aliqîn *ing.* pakewtene, re cikewtene, aleqiyene

alî *n.* het, hêm, teref, cahet *n.* ~ **bûn** *ing.* het biyene

~ **dar** *rd.* hetin, hêmin ~ **gir** *rd.* hetkar, mêlker, terefdar, hêmdar ~ **gire** **rastê** hetkarê rastî ~ **giri** *m.* piştdariye, piştewaniye, piştgirewtoxîye, piştgiriye, hetgirewtoxîye, hetgirewtoxênî, terefdariye *m.* ~ **girtin** *lg.* het

girewtene, het kerdene, teref girewtene ~ **gir** *rd.* hetkar, terefdar, hemhet, hetin, hetgirewtox ~ **giri** *m.* hetkariye, terefdariye, hemhetiye, hetiniye, hetgirewtoxîye, hetkarênî, terefdarênî, hemhetênî, hetinênî, hetgirewtoxênî *m.* * **ji aliye** ... hetê ... ra, hêmê ... ra * **ji aliye min** ve hetê min ra, hêmê min ra ~ **kar** *rd.* yawer, yarmetkar, yardimkar, destyar, ardimker, ardimci ~ **kar** *m/n.* yawer, yarmetkar, yardimkar, destyar, ardimker, ardimci *n.* ~ **kar bûn** *ing.* yarmetkar biyene, yawer biyene, yardimkar biyene ~ **karbûn** *m.* yarmetkarbiyayiş, yawerbiyayiş *n.* ~ **karxwaz** *rd.* yarmetkarperwer, destgirewtox, yardimperwer, xeyrwaz, xêrwaz, ardimwaz ~ **karxwazî** *m.* yardimperweriye, yarmetkarperweriye, xêrwazênî *m.* ~ **karê serok** *N.* yawerê serokî, yarmetkarê serokî, yardimkarê serokî *n.* ~ **karî** *m.* yarmetkariye, yardimkariye, yarmetkarênî, yardimkarênî *m.* ~ **kirin** *lg.* destek kerdene, yarmetiye kerdene, het kerdene, dest girewtene, dest cidayene, pişti cidayene, desteknayene ~ **kirin** *m.* destekkerdiş, yarmetiyekerdiş, hetkerdiş, destgirewtiş, destcidayiş, pişticiyadiş *n.* ~ **kirin** *lg.* het girewtene, het kerdene, teref girewtene. * **alîkî** hetê, yew het ~ **negir** *rd.* nêhetkar, bêhet, bêteref ~ **negiri** *m.* nêhetkariye, nêhetkarênî, bêhetiye, bêterefênî *m.* ~ **yê dîn** *N.* heto bîn, bover, wever, daşta, dot, weta, haver, cat *n.* ~ **yên bingehîn** *n.* bingehetî, hetên bingehênî, hêmên bingehênî *zh.*

alîkarî *m.* yarmetiye *m.*, yardim *n.*, ardim *n.* ~ **hatin kirin** *ltb.* destek cidiyene, destek ameyene kerdene, destek keriyene ~ **kirin** *lg.* yarmetiye kerdene, yardim kerdene ~ **xwaz** *rd.* yarmetkarperwer, destgirewtox, yardimperwer, xêrwaz, ardimwaz ~ **ya cîvakî** *m.* yarmetiya komelî, yarmetiya sosyalî *m.* ~ **ya hev kirin** *lg.* yarmetiya yewbînî kerdene, têyarmetiye kewtene, piştîya yewbînî girewtene, têhet kerdene, dest yewbînî dayene, destê yewbînî girewtene ~ **ya pêşîn** *m.* yarmetiya verêne *m.*, hawara verêne *m.*, yardimo verên *n.*

Alî Heq *N.* Eliheq *n.*

alîgor *m.* sale, salên gorne *m.*

alîn *lg.* têvdayene

alînazîk *m.* sogirme, babaxanuç, sogilme *n.*

alîsor *m.* lîksure, alişksure *m.*

alîze *m.* alîze, vayê alîzeyî *n.*

alkalî *rd.* *kîm.* alkali ~ **k** *m.* *kîm.* alkalîk, alkalên *n.*

alkol *m.* alkol *n.* ~ **ik** *rd.* alkolik, alkolên ~ **izm** *m.* alkolîzme, alkolîye *m.* ~ **metre** *m.* alkolpême, alkolmetre *m.* ~ **piv** *m.* alkolpême, alkolmetre *m.* ~ **xwarî** *rd.* alkolşimite, alkolên

Alman *m/n.* alman *n.* ~ **î** *m.* almankî *n.* ~ **ya** *m.* Almanya, Germany *m.*

almast *m.* almast, elmas, almas *n.* ~ **a reş** *N.* almasto sîya, elmaso sîya *n.*

alo *b.* alo, elo

alole *m.* tolme, piştuxe, sarme *n.*

aloq *n.* *ana.* vamikî, alukî, bilbancikî, nekî, çijeyê xazmikî, aloqî *zh.*

aloş *m.* hurîyayiş *n.* ~ **bûn** *ing.* hurîyene

aloz *rd.* puç, çurig, rizaye, poyaye ~ **î** *rd.* pisîye, puçîye, pisênî, puçênî

aloz² *rd.* alangîn, alozin, alozdar, alangdar ~ **bûn** *ing.* têalaziyene, têmiyan biyene, têalangiyene, werê kewtene, têmiyan kewtene, aloz biyene, aliziyene, alaziyene, aluziyene ~ **dar** *rd.* alangîn, alozin, alozdar, alangdar ~ **dar bûn** *ing.* alangîn biyene, alozin biyene, alozdar biyene, alangdar biyene

alozbar *rd.* rizbar

alozî *m.* şêlûpêl, anarşî, aloziye, têmiyanîye, qergundî, xilopilo, teşqe, babagundî, babaguniye *n.*

alqût *m.* anqûte, yaqûte, aqûte *m.*

altax *N/rd.* êxbarker, muxbîr, haydarnayox, xeberedayox, îxbarci ~ **î** *m.* êxbarkeriye, muxbiriye, îxbarciyênî, êxbarkerênî *m.*

altax *N.* babaxçi *n.*

altaxî *m.* babax *n.* ~ **tî** *m.* babaxîye *m.*

alternatîf *m.* alternatif, weçînk *n.*

altîmetre *m.* berziyepême, altîmetre *m.*

alu *rd.* halu, halêl, halê, saye, balî, helu (didanî) ~ **bûn** *ing.* halêl biyene, saye biyene, halî biyene, har biyene ~ **bûn** *m.* halêlbiyayiş, sayebiyayiş, halîbiyayiş *n.*

alû *m.* alûnçe, erûge, alûçe, hêrûge, alunça, alûnç, alinç *m.*

alû *m.* *bot.* alûnçêre, erûgêre, dara erûge, alinçêre, alûcêre, alinçyer *m.*

alû *n.* *ana.* beze, ginde, giloke, gilîye, gilî, gila *m.*

alû² *n.* *ana.* vamikî, alukî, bilbancikî, nekî, çijeyê xazmikî, aloqî *zh.*

alûceya Maltayê *m.* alinça malta, alûça malta, erûga malta, maltaalûnçe, maltaerûge *m.*

alûç *rd.* slîndîrîk, sîlîndîrên, sîlîndîrîk, slîndîrên

alûçe *m.* *bot.* alûnçêre, erûgêre, dara erûge, alinçêre, alûcêre, alinçyer *m.*

alûçe² *m.* canerûge, alinça kewîye, erûga kewîye *m.*

alûde *m.* pisîye, qevçîliye, leym û lêşe *m.*

alûle *rd.* kuçek, kuçeyo teng

alûme *m.* goceg, gîrsag *n.*

alûme *n.* *ana.* pudîye, pidûye, goştê didanî *m.*

alûs *rd.* narîn, nazenîn, zarîf, weşek ~ **î** *m.* weşikiye, zerafet, nazikiye *m.*

alûsî *m.* naz, cîlwe *n.*

alûşk *m.* *ana.* çene, çenike, çenge *m.*

alûze *m.* mêjeng, endîşe, xelxele, fikar, telaşe, xem, tatîr *n.*

ama *m.* tawike *m.*, miqil *n.*, tawe *m.*, qanzik *n.*, miqilîk *n.*, miqlê *n.*

amade *rd.* amade, hazir, hadire, hadr ~ **bûn** *ing.* amade biyene, hazir biyene ~ **kar** *m/n.* amadekar, tertîbci,

organizator, amadeker *n.* ~ **kirin** *lg.* amade kerdene, tertib kerdene, hazir kerdene, viraştene ~ **kirin** *m.* amadekerdiş, hazirkerdiş *n.* ~ **kiri** *rd.* amadekerde, hazirkerde, tedarekin, tedbirin ~ **nebûni** *rd.* amade-nêbiyayiş, hazirêbiyayiş ~ **yi** *m.* amadeyiye, haziriye, amadeyêni, hazirêni *m.*

aman *rd.* adî

aman *m.* fere û folî, qab û qacaxî, firaq û folî, qacaxî, qabûqacaxî *zh.* ~ **a ezmûnê** *N.* qabê cerebî, qabê desinayîşî, firaqê cerebî *n.*

amanc *m.* amance, xaye, amace, mexsed, hedefe *m.* ~ **dar** *rd.* amancin, xayedar, mexsedin, amacin ~ **kirin** *m.* amancerdiş, mexsedkerdiş, xayekerdîş, amackerdiş *n.* ~ **kirin** *lg.* amanc kerdene, mexsed kerdene, xaye kerdene, amac kerdene. ***hatin amanckirin** *ltb.* amanc keriyene, ameyene amancerdene, ameyene xayekerdene, ameyene mexsedkerdene

amator *rd.* amator ~ **i** *m.* amatoriye, amatorêni *m.*

ambar *m.* anbar, antoq, depo, embar, emar *n.*

ambargo *m.* ambargo *n.* ~ **danin** *lg.* ambargo ronayene, ambargo sernayene ~ **hılanin** *lg.* ambargo ravaznayene, ambargo berzkerdene, ambargo wedardene, ambargo berznayene ~ **rakirin** *lg.* ambargo ravaznayene, ambargo berzkerdene, ambargo wedardene, ambargo berznayene

ambelaj *m.* embalaje, ambalaje *m.* ~ **ker** *m/n.* ambalajci, ambalajker *n.* ~ **kirin** *lg.* embalaj kerdene, embalajnayene ~ **kirin** *m.* embalajkerdiş, embalajnayiş *n.*

amber *m.* amber *n.*

amblem *m.* amblem, nişanek *n.*

ambûlans *m.* ambûlance *m.*, canreyayişe *m.*, tomofila canreyayişi *n.*, canreyayişe *m.*

ambûr *n.* alet, hacet, pergal, halet *n.* ~ **in** *n.* alet, hacet, pergal, halet *n.*

amdagirtî *rd.* pêroyî, cihanpêroyî, şartêvterî, kaînati

ameliyat *m.* emeliyet, operasyon, ameliyat, emelet *n.*

Amerîka *m.* Amerika *m.* ~ **yi** *N/rd.* amerikayîj, amerikanîj

amerikan *m/n.* amerikan *n.*

amerziş *m.* mazeret, uzr, recivêrayiş *n.*

amêjen *m.* *kîm.* xalîte, alawt, alaşim, alawitiş *n.*

amêr *m.* çihaz, alet *n.*

amfibi *m.* amfibi, ajnemeşe, diciwîyanêne, dicuyanêne *m.*

amigo *n.* *sp.* amigo *n.* ~ **ti** *m.* amigoyîye, amigoyêni *m.*

amîn *b.* amîn

amîp *N.* *zoo.* amîp *n.* ~ **dar** *rd.* amîpin

amîr *m/n.* mîre, amîr, serfermandar *n.* ~ **ê derya** *n.* amîralê deryayî, deryamîr, oramîral, amîrê deryayî *n.* ~ **i** *m.* serfermandariye, mîreyîye, amîrêni, serfermandarêni *m.* ~ **i hêz** *n.* emîrhêz, hêzfermandar, fermandarê hêze *n.*

amîral *n.* amîral *n.* ~ **ê mezin** *N.* amîralo pîl, pîlamîral *n.*

amîrhez *n.* *lşk.* mîralay, albay *n.* ~ **i** *m.* mîralayîye, mîralayêni, albayêni *m.*

amoj *m.* najniye, datciniye, dedcini, cinîya apî, nacniye, amocine, amojen, niiaziniye, niyaj, emcike, emce, niyaj *m.* ~ **za** *n.* datza, dedza, dereza, lajê apî, deza, detza, apza, datiza, amza *n.*

amoj² *m.* îstişare, danişiyayiş, mişewre *n.* ~ **gar** *m/n.* danişmend, şewermend, mişawîr, şewerker *n.* ~ **garî** *m.* danişmendîye, şewermendîye, mişawîrîye, şewerkerîye, danişmendêni, şewermendêni *m.* ~ **kirin** *lg.* mişewre

kerdene, îstişare kerdene, danişiyene, ci şeweriyene

amojgar *m/n.* şiretkar, nesêtkar, penddayox, enderezci, şiretcî, şiretdayox, oğitdayox *n.* ~ **i** *m.* şiretkariye, nesêtkariye, penddayoxiye, enderezciyêni, şiretciyêni, şiretdayoxiye, şiretkarêni, nesêtkarêni *m.*

amojgeh *m.* înstîtitut *n.*, enstîtute *m.*, înstîtute *m.*

amonyak *m.* *kîm.* amonyak, amoniyak *n.*

amonyaq *m.* *kîm.* amonyak, amoniyak *n.*

amonyûm karbonat *N.* *kîm.* amonyûmkarbonat *n.*, xavika nişadiri *m.*, nişadîrxavike *m.*

amoş *m.* aş *n.*, hedure *m.*, teskin *n.*, haşt *n.*, hedire *m.* ~ **bûn** *lg.* heduriyene, teskin biyene, aş biyene, hediri-yene ~ **ker** *rd.* hedurnayox, teskiner, hedirnayox ~ **kirin** *lg.* hedurnayene, teskin kerdene, aş kerdene, hedirnayene

amper *m.* *fiz.* ampere *m.* ~ **metre** *m.* ampermetre, amperpême *m.* ~ **piv** *n.* ampermetre, amperpême *m.* ~ **saet** *N.* *fiz.* ampersaate *m.*

amplifikatpor *m.* berzkere, amplifikatpore, berznayoxe *m.*

ampûl *m.* ampûl *n.*

amraz *m.* wesayît *n.*, ragoze *m.*, wesaid *n.*, wesayit *n.*

amraz² *n.* alet, hacet, pergal, halet *n.* ~ **a tawanê** *N.* hacetê sucî, aletê sucî *n.* ~ **dar** *rd.* pergalin, hacetin, aletin ~ **ê ragihanê** *N.* pergale teweşiyayîşi, dezgehê teweşiyayîşi, pergale komunikasoyonî, hacetê teweşiyayîşi *n.* ~ **ên hilberiyê** *pj.* pergale îstihsalî ~ **ên peytandinê** *pj.* pergale tespiti, aletê tespiti ~ **i raguhaztine** *pj.* hacetê komunikasoyonî, hacetê teweşiyayîşi, dezgehê teweşiyayîşi

amûr *n.* alet, hacet, pergal, halet *n.*

amûr *m.* doşirme, tesîsat *n.* ~ **saz** *m/n.* doşirmeci, tesîsatci, doşirmeawan *n.* ~ **sazi** *m.* doşirmeciye, tesîsatciyêni, doşirmeciye *m.*

amûr³ *n.* *muz.* saz, enstruman *n.* ~ **a bayî** *m.* sazo nefesin, sazo pifin, sazo pufkerde *n.* ~ **ê fuyî** *n.* sazo nefesin, sazo pifin, sazo pufkerde *n.* ~ **ên jenî** *pj.* sazê gimnayîşi, sazê pirodayîşi ~ **ên jidar** *pj.* sazê têlinî ~ **ên lédanî** *pj.* sazê gimnayîşi, sazê pirodayîşi

amyar *m.* wesayît *n.*, ragoze *m.*, wesaid *n.*, wesayit *n.* ~ **ra dirêj** *N.* wesayito derg, wesitaya derge *m.* ~ **a motordar** *m.* wesayito motorin, wesitaya motorine, wesayito bimotor *n.*

an *paq.* an, on, un, u

an *g.* yan, ya ~ **ji** *g.* ya kî, yaxud, yan kî, yan zî

Anadol *m.* Anatoliye, Anadoluye *m.*

analîtik *rd.* tahlilên, analîtik, analizên

analiz *m.* tahlil, analiz *n.* ~ **kirin** *lg.* tahlil kerdene, analiz kerdene ~ **kirin** *m.* tahlilkerdiş, analizkerdiş *n.*

ananas *m.* ananase *m.*, ananas *n.*

ananas *m.* *bot.* ananasêre, dara ananase *m.*

anarşi *m.* şêlûpêl, anarşi, aloziye, tēmîyaniye, qergundi, xilopilo, teşqeale, babagundi, babaguniye *n.* ~ **st** *rd.* anarşist, şêlûpêlci ~ **zm** *m.* anarşizme, şêlûpeliye *m.*

anason *m.* *bot.* anason *n.*

Anatoliya *m.* Anatoliye, Anadoluye *m.* ~ **yi** *rd.* anatoliyeyîj, Anatoliyeyîj

anatomi *m.* anatomi *n.* ~ **st** *m/n.* anatomist, anatomizan, anatomişinas *n.* ~ **zan** *m/n.* anatomist, anatomizan, anatomişinas *n.*

anaxdara doyê *m.* *muz.* kilîtê doye, anaxtarê doye *n.*

ancax *g.* mela, tenya, tenê, ancax

- anç** *m.* efsûn, sêr, sêhr *n.*
andêr *rd.* madax, têrmaş, serxur, hermend, andêr, mêrat, bêwe, soxe, mêras, kambax, ondêr, mîrat, medax
andropoz *m.* andropoz *n.*
ane *paq.* -ane
anemik *rd.* kêmgonî, bêgonî, anemik
anesûn *m. bot.* anason *n.*
angaje *rd.* angaje ~ **bûn** *lng.* angaje biyene, angajiyene ~ **kirin** *lg.* angaje kerdene, taahut kerdene, angajnayene
angajman *m.* angajman, taahut, verabîyayîş, xosergi-rewtîş *n.*
